****

Cejna Jinan

Bi boneya cejna jinan li 8î Avdarê , P.Y.D.Ks daxuyanek weşand , li gel wê , gelek jinên kurd ên cefa di ber pirsa kurd e li Sûriyê dîne xelat kirin , û gelek komcivîn û şevbuhêrkên bîranîn û seyranan ji jinan re li darxistin .

Em jî ji aliyê xwe ve , wek komîta rêvebir a deranîna Rojnama Newrozê jinên cîhanê û bi taybetî jinên Kurd bi vê boneyê pîroz dikin ; Wekheviyê ji wan re hêvî dikin , û rola ku ji wan tê xwastin ji wan dixwazin.

Li 10.3.2007an , kat " 1 " ê nîvro , li ber roniya daxuyana ragiyandina Şam ya ku xwastî xwapêşandenekê li pêş avahiya dadmendê li Şam çêkê û nerazîbûna xwe bi boneyên 8 û 12 î Avdarê diyarbike .

Hemî hêzên ragiyandinê , li gel wan bi hevpişkiya komîta hevgirêdanê ya Partiya Azadî , Partiya Yekîtî ya Kurd û Teyar Musteqbel û li rex Partiya Elwîfaq , li ciyê seknandinê kom serhev bûn .

Lê hêzên ewlekariyê ya rijîmê li pêş wan sekinîn , ew ji hev belav kirin , dest danîn ser bi dehan ji beşdaran û girtin , piştî demeke kurt li derveyî bajêr , li ser riya Şam – Heleb ew serbest berdan .

Hêjaye bê gotin ku yên hatine girtin Kurd û Ereb bûn . Ji nav wan Riyad Sêf serokê ragiyandinê , Mustefa Cuma sekretêrê Partiya Azadî , Mislêm Şêx Hesem , Fayêz Sare , Heysem Meneh , Hesen Evdilezîm , Elî Elevdela , pênc jin , … H.W.D .

Ragiyandina Şam û Cejna Serxwebûnê

Li roja 17. 4.2007 an , roja serxwebûna welatê Sûriyê ji bin nîrê firansa , dora /100/kesî ji ragiyandina Şam çi Kurd çi Ereb li Helebê çûn ser gora xebatkarê Kurd Ibrahîm Heneno ,yê nemir û bi nav û deng e. Ew xebatkarê ku , jiyana xwe li ser riya azadkirina Sûriyê ji bin nîrê sitemkariyê daye . Li ser gora wî birêz Fatîhe hate xwendin , û rêzdar Hesen Ebdilezîm jî gotinek bi navê ragiyandina Şam pêşkêşî giyana wî kir .Di gotinê de , giringiya roja 17 Nîsanê diyarkir , xebat û cefakêşiya Ibrahîm Heneno û hemî xebatkarên serxwabûna Sûriyê berçav kir .Şîngirî:Li 12 î Avdarê îsal , bi boneya bûyera kambax ya sala 2004 an ; ji bîranîna xwînên wan pakrewanan , û pirotêsto û rûreşkirina yên li dû wê bûyerê , gelê me yê kurd li Sûriyê li hemî herêm û bajarên ku lê dijîn 5 kêlîk bêdeng li sukak û kastînan rawestiyan .

Tevgera Kurd li Sûriyê baxên gul û çîçekan danîn ser gorên wan şehîdan û fatîha ji bo giyana wan hate xwendin . Li hin ciyan jî gotin hatin pêşkêşkirin .

Herweha gelê kurd li Sûriyê , 16 î Avdarê , Helebça bi çekên kîmawî şewitî û mirina dora 5000 Kurd , bi pênc kêlîk bêdeng û li hin ciyan bi meş bi bîra xwe anîn . Bi dengekî bilind gotin na ji van karên hovane re û hemî kesên li pêş bên dadgeh û cezakirin .